



Avrupa Türkiyeli İşçiler Konfederasyonu  
Konfederasyona Karker ên ji Tirkîye li Ewropa  
Konföderation der Arbeiter aus der Türkei in Europa  
Confederation Workers from Turkey in Europe  
La Confédération des Travailleurs de Turquie en Europe  
Confederatie van Arbeiders uit Turkije in Europa

[www.atik-online.net](http://www.atik-online.net)

[konsey@atik-online.net](mailto:konsej@atik-online.net), [info@atik-online.net](mailto:info@atik-online.net) 5 Mart 2010

## Em êrîşên dewlet a Belçîka yê li ser saziyên Kurd û Roj TV'yê şermazer dikin!

Hêzên Belçîka yê ewlehiya dewletê di spêda 04 Avdar'a 2010'an de li ser 25 ciyên têvel û navenda ROJ TV'yê êrîş anîn û gelek kes biçav kirin. Di nav ciyên êrîşkirî de navenda KONGRA-GEL jî heye, li ku êrîşkeran dest dan li ser gelek belgeyên saziyê û hin siyasetmedarên Kurd ên wek Zûbeyîr Aydar, Adnan Uzun û Remzî Kartal û gelek kesên din biçav kirin. Tîmên antî-teror ên Belçîka'yê bi maskeyan ve êrîş anîn û gelek amûr û materyalên din ên saziyan, û nemaze yê ROJ TV'yê, xira kirin.

Li Ewropa'yê êrîşên wusa yê ku di nav çarçoveya zagonên antî-teror de pêk tên her diçe zêdetir dibin. Beriya vê êrîşê, li Îtalya û Frense'yê jî êrîş hatîbûn anîn li ser saziyên Kurd û di encamê de bi dehan kes hatîbûn biçavkirin. Li Almanya'yê jî hêzên dewletê êrîş anîbûn li ser komeleyên Federasyona Anatolya'yê û 2 kes hatîbûn biçavkirin.

Divê em ê bi bîr bînin ku ew êrîşan bîskekê piştî civîna navneteweyî ya ku li Spanya'yê pêk hat bicîh bûn. Diyar e ku ew bûyerên dawîn ne bi awayekî ketoberî pêk hatine. Di vê civînê de vezîr û serokwezîrên hin dewletan amade bûbûn. Serokwezîrê Tirkiye'yê Tayyîp Erdogan jî, bi gelek vezîrên xwe ve, beşdarî vê civînê bûbû û hin rêxistinên şoreşger û pêşverû yê li Ewropa'yê weke hedef destnîşan kirîbûn. Bi zelalî xuya ye ku pakêtên wan ên vebûnên demokratîk tenê ji bo tasfîyekirina tevgera neteweyî ya Kurdan hatine pêşkeşkirin û ku di vî warî de hemfikiriyekê navneteweyî li holê ye.

Bi rêya zagonên "antî-teror" ve, ku li Ewropa'yê bi awayekî hemdemî tên derxistin, dixwazin teror û çewisandinên dijî rêxistinên ku têkoşînên rizgarî ya neteweyî û civakî didomînin her girantir bikin û dikin jî. Êrîşên wusa destnîşan dikin ku burjûvazîya emperyalîst û rejîma faşîst a Tirkiye'yê berband û patoxur ji peresîna tevgerên şoreşger, pêşverû, û neteweperwer ditirse û ji tirsên xwe jî xwe davêjin bexta şîdet û êrîşê. Lê belê ew erîşên ku bi salan e berdewam in heta niha biserneketine li hemberî tevgera neteweperwer a Kurdan yan jî li hemberî saziyên şoreşger-pêşverû. Ji vê pê ve jî ew ê nikanîbin pêşveketina wan bidin sekinandin. Çapemeniya azad a Kurdistan û saziyên demokratîk, bi piştevaniya navneteweyî ya saziyên dinên niştecih û koçber ve, dê têkoşîna rizgariya neteweyî de erkên xwe bicîh bînin.

**Bi navê Konfederasyona Karker ên ji Tirkiye li Ewropa'yê, em êrîşên dewlet ên Îtalya, Frense, û Belçîka'yê şermazar dikin û didin zanîn ku em ê piştevaniya ROJ TV û saziyên demokratîk bikin.** Herwiha, em bang li hemû hêzên niştecih û koçber ên şoreşger, demokratîk, û pêşverû dikin da ku dengên xwe hemberî wan erîş û pêkutîyan bilind bikin û piştgirî bidin saziyên Kurd. Ti hêz nikane xebatên demokratîk ên saziyên Kurd asteng bike û dengê azad ê Kurdistanê ROJ TV'yê bêdeng bike.

**Êrîşên Belçîka'yê hemberî saziyên Kurd û ROJ TV'yê şermazar dikin!**

**Dengê azad ê Kurdistanê ROJ TV nikane bê bêdeng kirin!**

**Bijî biratiya gelan!**